


ROJANÛ

kovara huneri çandi û edebi



Turba Ehmedê Xani

42
1995

NAVEROK

Mem û Zin ji nû va derket.....	3
Çend Qesideyên E. Xani - Vazgal Bazidi	4
Pirtûka N. Zaza: "Jiyana min a kurdi" - Bertil Galland	10
Çend gotinên bijarte	13
Yekê Gulanê tim bi we ra me -	14
Ba û Bahoz - Kemal Burkay	16
Cûreyeki edebiyata bedew: Kurteçirok - Haluk Öztürk	19
Pexşana kurdi ya huneri - Ferhad Shakely	20
Jineke ku esman serê xwe jê re bihingivine - Husên Hebeş	26
Bilbilê min iro parsê dîke - Ehmed Tewfiq	27
Hevpeyvîn: Bi Evdîlayê Mela Reşîd ra - V. Bazidi	28
Newroza 1995` a li Stockholmê	31

Sal: 16

Hejmar: 85, Gulan 1995

ISSN 0283-5355

XWEDÎ: KOMKAR-Swêd
BERPIRSIYAR: Şêroyê BOTAN
NAVNIŞAN: Gustavslundsv.168,1 tr
161 36 STOCKHOLM
TELEFON : 08/ 26 23 75
HESAP NO: PG. 458980 - 0

UTGIVARE: Svensk Kurdiska
Arbetsföreningen
ANSVARIG UTGIVARE: Ş.BOTAN
ADRESS: Gustavslundv. 168, 1 tr.
161 36 STOCKHOLM
FAX: 08/ 25 38 57
PG: 458980 - 0



MEM Û ZÎN

JÎ NÛ VA DERKET!

Destana neteweyî ya kurdi
dî 300-saliya xwe da jî nû va bî
çapeke delal hat weşandin

Nivîskarê Kurd M. Emin Bozarşan, piştî xebata
sê salan destana me ya netewî "Mem û Zîn" dî
300 saliya wê da jî nûva da çapkirin û belavkirin.
Bozarşan ew hem jî tipên erebî wergerandiye
tipên latîni, hem jî wergerandiye kurdiya xwerû û
pêşkêşî xwendevanan kirîye.

Nivîskarê hêja , jî bo "Mem û Zîn"ê pêşkêşîyeke
dirêj (110 rûpel) nivîsiye. Dî wê da hem Ehmedê
Xani hem jî "Mem û Zîn"ê dide naskirin.

Ev şaheser bî çapeke delal û bî cild hatiye çapkirin.
Pirtûk 703 rûpelan pêk hatiye. Jî bo xebata wî ya
giranbîha em nivîskarê hêja M. Emin Bozarşan
piroz dîkin û jê ra serfiraziyên nû dîxwazin.

Navnîşanên xwestinê:

Jî Swêdê:


M. EMIN BOZARŞAN
P.O. BOX 3050
S- 750 03 UPPSALA/ SWEDEN

Jî Almanyayê:

KOMKAR
Hansaring 28-30
D-50670 KÖLN
GERMANY
Tel: 49/0221/123376
Fax: 49/0221/123485



Wergêrê tipên Latîni û Kurdiya xwerû:
M. EMİN BOZARŞAN



M. Emin BOZARŞAN



Çend qesideyên Ehmedê Xani -1

dî destnîvisarên Mele İbrahimê Zîvingî da

Ev qesideyên Ehmedê Xani, Mele İbrahimê Zîvingî bî dest nîvisandîne. Mele İbrahimê Zîvingî, bîrayê Mele Ehmedê Zîvingî ye, yê ku diwana Meleyê Cızîrî bî erebî şîrovekîrîye û nîvisîye. Gelo Mele İbrahim ew qesideyên Ehmedê Xani yê ku bî devkî dî nav gel da têne gotîne berhevîkîrîye, yan evana raste-rast yê Ehmedê Xani nî ? Ev esse nayê zanî.

Ev destnîvisara lî Sûrîyê, kopîkîrî lî cem hî kesan henîn. Mî ji du heb kopî bîdestxîst. Mî kopîya ku bî tipê Erebi ye ji xwe ra bîngê hîlda. Ya dî tenê bî tipê latîni ye. Hemû qesîde wek hev in. Lê dî nav ya latîni da qesîdeyek heye ku dî ya dî da nîne. Dîsa hî malîk dî ya latîni da zêde nî.

Jî ber ku kek Mehmed Emin Bozarîslan dî vî wari da pîspor e, mî herdu nusxe-yên wê ji wî ra şand. Kek Mehmed Emin lî wana mêzekîr, da berhev û menên peyv û hevokan bî notên jêrî nîşan da û ji mî ra şand.

Helbet dîwê lî ser van helbestan lêkolîn bêne çêkîrî. Dî vî wari da zana û pîsporên me henîn, dîbe ku lî nîk wana ji evana peyda bîbî. Lê mî bî xwe ew hemû gelhev çapkîrî heta nuha nedîtiye.

Dî vê sala qedîrbîlînd da bî vî kari va ez dîxwazîm rastî derkeve meydanê. Heke evana yê Ehmedê Xaniyê nemîr bî, bîla bîkevî nav defteran û ji wundabûyîne xîlas bîbî. Heke ne hemû, tenê çend heb ji yê wî bî, dîsa ez ê xwe bextewar bîhesîbînim.

Vazgal Bazîdî

Me dî neqşek jî neqşê neqşebendan
Vebûn bendên dî mî yek bî yek jî zendan

Kuşada dîl jî bo mî ra muyesser(1)
Nêbûbê suhbeta sûretlewendan(2)

Lî mî gîrtî rîya Kabe, wîsalê(3)
Dî şîklê qameta balabîlîndan(4)

Me sed hêvî heye îro jî seyyad(5)
Me azad ket jî qeyda qeyd û bendan

Dî îro sexweş îm wellahî waz(6)
Lî mî dai neke van nûsh û pendan

Heçî gerya bîtin pêlek lî îşqê(10)
Dîbîtin aqîbet ew jî jî çendan(11)



Turba Ehmedê Xani

"Jî ahiyanê jî mahê xestenim mam
Dilê min ma dî nêv mîşkin kemendan"

Dilê Xani eger çî gencexan e (12)
çikîr qet kes nego "Xani bî çendan"

1- *Kuşa dîl: Vebûna dîl, firehiya dîl, şayiya dîl, dilgeşi.*

2- *Muyesser: Hêsan, rehet, tîştê ku bî hêsanî dîçe seri.*

3- *Sûretlewendan: Ewên ku bî şekl û awayên xwe xweşik, spehi ne.*

4- *Wisal: Gihana ciyek, Dî zmanê evinê da, gihana cem yarê.*

5- *Seyyad: Nêçirvan.*

6- *Waz: Kesê ku waz dîde xelkê.*

Dî destnwisareke dî da "ez iro nexweş im wellahi wîz" hatiye nwisandîmê.

7- *Nush û pendan: "Nush" erebi ye, "pend" jî farisi ye.*

Dî destnwisareka dî da "we'z û pendan" hatiye nwisandîmê.

8- *Jî ahiyanê jî mahê: Jî ah û nalîn û hewarên jî destê Hivê. Jî destê wê yara wek Hivê xweşik û bedew.*

9- *Mîşkin kemendan: Kemendên miskin, kemendên jî misk. Kemendên wek misk bêhnxeş. Mexsed zulf û biskên yarê ne.*

10- *Pêlek: Demek, wextek. Mana peyvika "pêl" lî vîr "dem" e.*

11- *Aqîbet: Dawî, paşî. Yanî "dî dawiyê da jî çend tîştan dibe, dî dawiya wê gerê da jî çend tîştên xwe dibe, gelek tîştên xwe bî der dîde, wînda dîke".*

12- *Gencexane: Xana xezineyan, xezinexane, xaniyê ku xezine tê da ye, ciyê ku xezine tê da heyê.*

.....
Ez çûme derê meykedeê sibheyek
zû(1)
mîn dîti yeke esmer

Qamet bî misalê darê şîmşadê,
du gêsû(2)
manendê du ejder(3)

Mahê mutereqqib meykede û mezherê i'caz (4)
carek bî dused naz

Halê me tefahhus bike bêje ku "feqiro (5)
ez bo te me xemxwar" (6)

Çin çin dimeşin bîsk-î lî ser gulşenê ruxsar (7)
manendê du şehmar

Geh geh dîxuşin zulf-î lî ser qewsê du ebrû (8)
manendê du şehper (9)

Mîn gotê "dî weqtê seherê ew çî te da mîn
ey serweqeda mîn?" (10)

Go "ma tu nîzani çî ye mîn da te, feqiro?
E'teytuke Kewser"(11)

Hingi melek û hor û peri bêne temaşa(12)
haşa summe haşa (13)

Kengê dibin ew laiqê nezzareê ebrû!(14)
Ey dil, meke bawer

Yarê ji derê meykedeê mîn meke bêpar
ey seyyidê muxtar(15)

Saqi ku tu yi eşhedu billahi dî iro(16)
Xani bûye meyxwar(17)

1- Meykede: Meyxane

2- Bî misalê darê şîmşadê: *Wek dara şîmşadê, mîna wê.*

Gêsû: *Kezi, guliyên por.*

3- Manendê du ejder: *Wek du ejderhayan.*

4- Mahê mutereqqîb meykede: *Hîva çavnêra meyxaneyê, hîva ku li meyxaneyê çavnêri dîkir; yanî dîşîbiya hîva çavnêr.*

Mezherê i'caz: *Ciyê xuyabûna mu'cizayan; yanî mu'cize jê dîxuyan, mu'cize jê diyar dibûn.*

5- Tefehhus: *Lêgerin, kontrol.*

6- Xemxwer: *Ji bo ku qafiyeya vê malikê li ya malikê dîm bê, peyvîka "xemxwar" bî awayê "xemxwer" hatiye nîvisin.*

7- Çîn çîn: *Xelek xelek. Peyvîka "çîn" di edebiyeta Kurdi ya klasîk da tenê ji bo bîskên xelekîrî hatiye bikaranîn û tîm du car hatiye nîvisin; yanî bî awayê "çîn çîn".*

Melayê Cizîri ji di helbesetêka xwe da go-
tiye "Çîn çîn kîrîm zulfên siyah."

8- Qewsê du ebrû: *Kevanê du birûyan. Her du birûyên kevani.*

9- Manend: *Wek, mîna.*

şehper: *Rîşa dirêjtîrîn di baskên teyran da.*

10- Serweqed: *Ewa ku bejna wê dîşîbe dara serwê. Hozanên berê bejnên yarên xwe şîbandîme dara serwê.*

11- E'teytuke Kewser: *Mîn Kewser da te. Mîna ava Kewserê da te.*

12- Hindi: *Dî destnîwisareke dîm da dî şûna vê peyvîkê da "hingi" hatiye nîvisin.*

13- Summe: *Paşê careka dîm ji "Haşa summe haşa" heyê. Ev îdyomeki Erebi ye. Dema mîrov bîxwaze qutûbîr nebûna tîşteki bîde zanîn, mîrov vê îdyomê dibêje.*

14- Nezzareê ebrû: *Nihêrtîna birûyan. Mêzekîrîna li birûyan.*

15- Seyyidê muxtar: *Berêzê bîjare.*

16- Saqi: *Meyger.*

Eşhedu billahi: *Ez bî Xwedê şahîdî dîdîm. Ev peyv di Erebi da îdyomek e. Dema mîrov bîxwaze rastiya tîşteki qebûl bîke û bîde zanîn, mîrov vê îdyomê bî kar tîne.*

17- Meyxwer: *Ev peyvîk bî eslê xwe "meyxur" e. Ji bo ku qafiyeya vê malikê li ya malikê berî wê bê, li vîr bî awayê "meyxwer" hatiye nîvisin.*

Dî fesla çardehê Nisan
Me dibû dilberek disan(1)
Dî dil meşe'l çîra isan(2)
Me can da, şubhê perwanê(3)

Me dîl da dilberek sade
letîf û şêx û begzade(4)
Jî qeyda kîr'me azade(5)
Nihani bîr'me diwanê(6)

Nihani xelwetek da mîn
Jî la'lan şerbetek da mîn(7)
Bî weslê suhbetek da mîn(8)
Kîrîm bende di fermanê(9)

Dî fermanê ku hazîr bît(10)
Ê naxwaze mînafiq bît
Dîvê her dem muwafîq bît(11)
Weki şêxê di Sen'anê(12)

Weki şêxê di hazîr bît
Lî fermanê ku nazîr bît(13)
Bî emrê dostê kafîr bît
Bîsojît suhfê Qur'anê(14)

Dîsojîm suhfê mektûbê
Bî emrê yar û mehbûbê(15)
Demî dîl dîm bî metlûbê(16)
Dîdîm ez dîn û îmanê

Eger dilber mecazî bît(17)
Jî rengê lebsê xazî bît(18)
Bîla sofî nerazî bît
Bîmîni ew di hîrmanê(19)

Bînê, sofî qewî dîn e(20)
Weki xeffaşê mîskîn e(21)
Lî nîk wî roj, çû reng nîne(22)
Xwe nabîne jî emyanê(23)

Dilê wi kor e ama ye(24)
Ji weslê dûr-i da maye(25)
Lî ber wi derge dadaye(26)
Nehîşte bête diwanê(27)

Ez im serxweş lî wê camê(28)
Ez im sewda dî nêv amê(29)
Ez im enqa ketim damê(30)
Bî zulfa ser xalan danê(31)

Bî zulfa hate ser xalan
Bînefşa titek û alan(32)
Dil û canê me ebdalan
Dîbir disa bî talanê(33)

Dî talana ku serxweş çûn(34)
Hezar genc û we cewher çûn(35)
Dilê sed pare, ker ker çûn(36)
Tu Xani bes ke efxanê(37)

1- *Disan*: Disa. Ji bo ku qafiye li malikên din bê, tîpa "n" li peyvîkê hatiye zêdekirin û peyvîk bûye "disan".

2- *Meş'el*: Meşale, mêlede. Meş'el Erebi ye, Mêlede Kurdi ye.

Isan: Isiyani, bîriqin.

3- *Perwane*: Fîrîfîroka ku xwe davêje agir.

4- *Letif*: Narin û nazik û nerm.

şox: şên, kêfxweş û dilgeş. Ev peyv di destnwisarê da bî awayê "şêx" hatiye nwisin. Lê belê wek diyar e ew awa şaş e, lewra ji yaran ra "şêx" na "şox" tê gotinê.

5- *Kir'me*: Ji bo pîveka (wezî) malikê neşikê tîpa "i" ya dudayan ketiye peyv bûye "kir'me".

6- *Nihani*: Nepeni, bî dîzi. Bê ku kesek bîbine û bîzane.

7- *La'l*: Kevîreki rûmetbîlînd e. Ji ber ku rengê wi sor e, hozanên berê lîvên yarên xwe şîbandîne wi kevîri.

8- *Wesl*: Gihan. Wek idyomek, ji bo giha-na cem yaran tê gotin.

9- *Bende*: Kole, dil.

10- *Peyvîka hazîr* di herdu destnwisaran da ji uha derketiye. Lê qafiya wê li her du malikên pey wê nayê. Ji ber vê yekê bî ditîna min, divê ku peyvîkeka wek "laiq" be.

11- *Muwafîq*: Lêhati, hevkar, ne dijkar, ne muxalîf, ne çewt.

12- *Şêxê di Senani*: Şêxê Sen'ani ku bûye

evindarê keça hukumdarê Ermenistanê û li pey wê çûye wir. Hozanê Kurd yê nemir Feqiyê Teyran, çiroka wi helbestki nwisîye.

13- *Ku nazîr bî*: Ku çav li rêbe, ku întîzar bîke, ku bînhêre, bîpê.

14- *Bîsojî*: Bîşewitîne.

Suhfê Qur'anê: Rûpelên Qur'anê.

15- *Mehbûb*: Yar, Evandî.

16- *Metlûb*: Yara daxwazkîri, yara ku ji min ra daxwaz e.

17- *Mecazî*: Ne rastin, ne heqîqî, ne rûda.

18- *Lebsê xazî*: Cilên xazîyan, kîncên şerkaran.

19- *Hirman*: Bêparî, mehrûmîyet. Di destnwisarekê din da ji "heyran" hatiye nwisin. Man wê ji "heyret, şaşbûn" e.

20- *Bînê*: Bînhêre. Ji bo peyvîka malikê neşikê, peyvîk hatiye kurtkîrî û bî awayê "bînê" hatiye nwisin.

21- *Xeffaş*: şevşevok, teyrê ku bî roj xwe di ciyên tari da vedîşêre û bî şev difire.

22- *Yanî* "lî nîk wi bî çu awayek û bî çu renek roj tune".

23- *Jî emyanê*: Ji koritîyê, ji ber koritîyê, ji rûyê koritîyê. Di destnwisarekî din da ji "xwe naspêrit" hatiye nwisin. Wîsa tê zanîna ku ew awa bî şaşî hatiye nwisin; lewra li wir qala nebiya şevşevokê tê kirîna, ne ku qala spartîmê.

24- *Ama*: Kor, nebin, ev peyvîk Erebi ye.

25- *Yanî* "dî dûr da maye, lî ciyê dûr maye".

26- *Dada ye*: Gîrtî ye, dadayî ye.

27- *Dî her du destnwisarên heyî* da ji peyvîka serê vê malikê weha "nehîştîye" hatiye nwisin. Bî ditîna me, ev şaş weha hatiye nwisin û awayê rast "neşête" ye. Yanî "nîkare, neşê". Ji ber ku dergeh dadayî ye, ew neşê bê diwanê, nîkare bê diwanê.

28- *Jî wê camê*: Ji wê qedehê.

29- *Dî nêv amê*: Dî nav alemê da, dî nav gel da.

30- *Dam*: Davîk.

31- *Yanî* "bî wê zulfa ku serê xwe daniye ber xala lî rûyê yarê".

Ji bo ku qafiye rast bê, peyvîka "dani" bî awayê "danê" hatiye nwisin. Di destnwisareka din da "bî zulfa ser xalan danê" hatiye nwisin. Lê belê ew awa ne rast e; lewra pîveka malikê dîşîkê.

32- *Dî her du destnwisaran da ji* "titek"

derketiye. Bı ditma me ew awa şaş e. Awayê rast "çiçek" e; yani "binefşa nava çiçek û alalan". Mexsed yar e; hozan ew şibandiye binefşeka wisa.

33- Dı destnwisara dın da, "dibut disa" hatiye nwisin.

34- Dı her du destnwisaran da ji "serxweş" derketiye. Lê belê bı ditma me, ji bo ku qafiyeya vê malikê li ya malikên hati bê, divê ku ev peyvîk "xweşser" be.

35- Genc: Xezine. Dibe ku awayê rast "genc û mucewher" be.

36- Ker ker: Parçe parçe, keri keri, keri keri, parçe keri.

37- Efxan: Hewar ûgazi, fixan û feryad.

Ehmedê Xani ev rîstên jêrin bı zmanê Erebi, Farîsi, Tırki û Kurdi nîvisiye. Evana dı diwana Evdilreqib Yusuf da hene ku ew Diroka Dewleta Doski nîvisandiye. Gelek kes li ser van rîstan hemfikir in ku yeqin yên E. Xani nın.

Fate umri fi hewake ya hebibi kulle hal(1)
Ah û nalım hem demem şud der firaqet mah û sal(2)

Ger benim qanım dilersen çoqdan olmişdir helal(3)

Din û ebter bûm jı ışqê, mın nema aql û kemal.(4)

Ente fikri fi fuadi ente rûhi fi cesed(5)

Leşkeri xemhayı to mulki dilem wêrani kerd(6)

Dade geldim ışq elından isterim senden meded(7)

Wan Teteran birne yexma aql û din û milk û mal.(8)

Tale hemmi zade xemmi şae sirri filmela (9)

Teşnei cami wisalım çûn şehidi Kerbela (10)

Yoqsa sen diwane oldun, nice halın ey dila?(11)

Yan jı nûve işweyek da mın hebiba çavxezal(12)

Bitûhicaranen hebibi lesti minni alimen (13)

Her dem ez derdi firaqet, xafil i ez hali men(14)

Can û dilden arz-ı qıldım halımı canane ben(15)

Erzihala mın tu xafil, qet nepırsi erzê hal.(16)

Hel lena min ni'meti weslil-hebibi min ne-sib?(17)

Ufıfad em ber deret, biçare, sergerdan, xerib(18)

Derdimiz çoq, lêk-i senden one yoq hiç bir tebib(19)

Ey tebibê mın, dewaê derdê Xani her wi-sal.(20)

1- Mana vê malikê ev e: "Ey xweşdwiya mın, dı her rewşek da umrê mın dı evına te da xerc bû".

2- Mana vê malikê ev e: "Dı cudayiya te da, bı meha û salan ah û nalinên mın bûn hevalên mın".

3- Mana vê malikê ev e: "Eger tu xwına mın dixwazi, ji mêj ve helal bûye".

4- Ebter: Bêxêr, bêkêr, bêfêde.

Kemal: Gihan, gihıştin.

5- Yani "Dı dilê mın da fıkra mın tu yi, dı laşê mın da ji giyanê mın tu yi.

6- Yani "Leşkerê xemên te, welatê dilê mın wêran kır".

7- Yani "Jı destê evinê ez hatıme ku dad bixwazım, ez ji te alikari dixwazım.

8- Mexsed ji "Teteran" her du çavên yarê ne. Jı ber ku Tatar berê pır êrişkar û wêranker bûne. Hozanên berê çavên yarên xwe şibandine Tataran. Jı ber ku Tırk ji êrişkar û wêrankar bûne, hın hozanên berê çavên yarên xwe şibandine Tırkan ji. Melayê Cıziri, dı helbesteka xwe da ji yara xwe ra weha gotiye:

"Geh dil û geh can dibın, Tırkên te tèn Nakırın yexma û talanê xelet"

9- Yani "Kederên mın dirêj bûn, xemên mın zêde bûn, sıra mın dı nava mirovan da belav bû".

10- Yani "Ez tiyê qedeha hevghıhanê me, wek şehidê Kerbelayê".

11- Yani "Ey dil, yan gelo tu din bûyi, rewşa te çi ye?"

12- İşwe: Naz, xwe şirin kırım.

13- Mana vê malikê weha ye: "Ey xweşdwiya mın, ez ketım cudayiye û

dûriyê, tu bî min nîzani".

14- Mana vê malîkê weha ye: "Her dem jî derdê cudayîya te, tu bêhayî jî rewşa min..." Malîke pey vê malîkê, dewama wê malîkê ye, her du bî hev va girêdayî ne.

15- Mana vê malîkê weha ye: "Mîm jî giyan û dil rewşa xwe jî yarê ra pêşkêşkir, erzkir, pê da zanin". Ev malîk dewama malîka Farîsî ya berin e. Mana her du yan bî hev va girêdayî ye.

16- Erzîhal: Daxwazname.

Qet nepîrsî erzîhal: Qet lî erza halê min nepîrsî, qet lî pêşkêşkirîna rewşa min nepîrsî".

17- Yanî "Jî nîmeta hevghîhana yarê, gelo dê nesîbekî me hebe; gelo dê nîmeta me gîhan cemîyarê jî me ra bibe nesîb?"

18- Yanî "Ez lî ber derê te ketî me, bêçare me, sergêjîm û xerîbîm".

19- Peyvîka "one" dî her du destnîwisarên heyi da jî weha hatiye nîwsîn. Bî dîtîna me ev awa bî şaşî weha hatiye nîwsîn û awayê rast "ote" ye, ku dî Tûrkiya nûda bî awayê "îte" tê karanîn; yanî "jî te pê va, jî bîl te, xeyn jî te".

20- Dewa: Derman

(1)

Zahîdê xelwetnîşîn, papendê kîrdarê xwe ye(2)

Tacîrê rihletguzîn, dîlnarê dînarê xwe ye (3)

Aşîqê dilberhebin dîldarê didarê xwe ye(4)
Da bîzani her kesek bê şubhe xemxwarê xwe ye

Bê emel tu j'kes meke hêvî eta û hîmmetê (5)

Bê xerez nakêşîtin qet jî bo kes zehmetê(6)
Kes tune qet hîlgirtîna barê te ew bê ucetê (7)

Ger çî Îsa bî, ewî vêk ragîrê barê xwe ye (8)

Hoşiyarî bî, da neki umrê xwe bê hasîl tel-ef(9)

Ku nedaye faide mal, genc ûewlad ûxelef (10)

Macerayê Xîdr-î diwarê yetimî bûselef(11)
Vî zemani her kesek mîmarê diwarê xwe ye

Xaniya, zayî' meke umrê xwe ey nadan, ebes(12)

Bê teleb nabî jî îeqê behremend, ey bulhewes(13)

Saniê mutleq, ku nine ihtiyaca wî bî kes (14)

Lutf ûîhsan jî ewî, der heq telebkarê xwe ye(15)

1- Ev helbest dî kovara "Jin" da jî derketiye. Cîld III, r.547.

2- Zahîdê xelwetnîşîn: Ibadetkarê rûmîştîyê xelwetê.

Papendê kîrdarê xwe ye: Ling girêdayîyê karê xwe ye.

3- Tacîrê rihletguzîn: Bazarvanê gerok, bazarvanê ku ger bîjartîye ûjî bo frotîna malê xwe yê ticaretê digere.

Dîlnar: Dîlagîr, dîşewîti, kesê ku dilê wî dîşewite.

4- Dilberhebin: Dilberevin. Dî destnîwisarek da wîsa derketiye.

Didar: 1) Rû. 2) Dîtm. Mexsed rûyê yarê yan jî dîtîna wê ye.

5- Amel: Kar, xebat, tevger.

Eta: Dayîn

6- Bê xerez: Bê mexsed, bê amanc, bê daxwaz.

7- Dî kovara "Jin" da "kes nehîm" derketiye.

8- Dî her du destnîwisaran da "evî fîkra ker û barê xwe ye" hatiye nîwsîn. Yanî "dî fîkra ker û barê xwe da ye".

9- Bê hasîl: Bê ked, bê ku tîştêk bîkeve dest û bîhesîle.

10- Genc: Xezîne.

Xelef: Kesê lî pey kesekî dîm. Lî vîr mexsed ewlad m. Dî her du destnîwisaran da ev malîk weha hatiye nîwsîn:

"Lew ku nadît faide genc, mal û ewlad û xelef".

11- Mana vê malîkê baş nayê famkîrîm. Dîbe ku şaşîyek tê da hebe.

Ebes: Tewş, bê fêde.

13- Behremend: Pardar, xwedîpar.

Bulhewes: Heweskar, xwedîhewes.


14- Saniê mutleq: Afîrandoxê xweser, afîrandoxê ku hêza wî bêsinor e. Mexsed Xwedê ye.

15- Lutf û Îhsan: Qenci.

Telebkar: Daxwazkar, kesê ku tîştêk dîxwaze.



Dewam dîke



Pirtûka

NUREDİN ZAZA

"Jiyana min a kurdi" derket

Pirtûka ronakbir û welatparêzê kurd Nuredin ZAZA, demekê beri nuha bi zimanê tirki jî derket. Pirtûk jî ali Mezopotamya Publishing va li Swêdê hatiye weşandin.

Zaza di pirtûka xwe da biraninên xwe nivisîne. Orjinalê wê bi zimanê fransi ye û du caran li Swisrayê hatiye çapkirin. Cara pêşîn wi di saxiya xwe da li Lozanê dabû weşandin (1982). Piştî mirina wi çapa duwemin jî disa bi fransi hatibû weşandin (1993 Geneve).

Di sala 1986`an da dema ROJA NÛ bi welatparêzê hêja Nuredin Zaza ra hevpeyvînek çêkir û jê daxwaz kir ku hineki behsa xwe û jiyana xwe bike jî bo xwendevanan, wi salixê vê kitêba xwe dabû û gotibû ku derheq wi da hertîşt li vir nivisiye. Daxwaza wi ew bû ku kitêba wi jî fransi bê wergerandin û bigiye destê xwendevanên kurd û tirk jî. Wi hingê mîqaleyê rojnameyê swisri - ku li ser kitêba wi hatiye nivisandin- jî me ra şandibû.


Nuha bi munasebetê çapa nû ya biraninên wi, em wergera vê mîqala Bertil GALLAND pêşkêşî xwendevanan dikin. Ew piştî çapa yekemin di sala 1982`an da di rojnameya "24 heures" (24 Saet) da bi zimanê fransi hatiye belavkirin.

Jiyana min a kurdi

Pirtûkên ku li ser pirsên siyasi tîn nivisandin, gerek e eyni wek pirtûka Nuredin Zaza ya ku demekê beri nuha hatiye weşandin, bi qalkirina dema zarotiyê va dest pê bikin. Siyaset, bi ilhamên heta tu bêji girîng va, bi şeweyê behskirinê va û bi qencyên ku mirov tu wextê jî bir nake va girêdayi ye. Çawa ku di rûpelên pêşîn yê kitêba "Jiyana min a kurdi" da hatiye pêşkêşkirin, pêşdihatina dayikekê, kenekê, peyv û gotinên ku qedera geleki bi kurtbiri tinin ziman, geleki di cih da ye.

Ew jî siyaset e, dema ku zarokek, li gor xwe nemirinekê dide serpêhati û biraninên xwe; dimen û manzarayên ku zarotiya xwe

da jiyaye, berfa pîr ya zivîstana çiyân, behivên ku bihna biharê belav dikin, ava çavkaniyan ya ku di kele-kela havinê da di binê dara maziye ra dikîşe, keriyên pez, hespên jar yên ku li mêrg û beyaran çargav dîbezin. Otel tune ne li ser gir û kaşên geliyên çemê Diclê, lê jî bo mêvanan malên malbatên mezîn hene. Bi sedsalan jî rêwiyên ser rîyan ra bûne qonax.



Bertil Galland



Kurdistan... Ew welatê ku zimanê wi ji familya zimanên indo-ewrûpi ye, yê ku têda peyva pêre wek peder û mîre wek mader tê gotin hina iro diji. Bî desmal û egalên xwe va ku ji yê eraban cuda ne, bî evsane yê xwe yê epiki, bî

mamîk û metelokên xwe va ... Yek ji gotinên pêşyan, çarenûsa vi geli pîr baş tîne zîman: "Dema deve şer dîkîn, ker û qantir di bin piyên wan da dîmrîn."

Kurdistan di rojên me da di bin lîngan da tê pêşkirin. Eger em herêmen çiyayî yê ku kurd lê dijin - Cografya ku ji Derya Reş heta delavê Farîsî, ji nîkê Derya Spî bigre heta zozanên Îranê dirêj dibe- bî Kurdistan nav bîkîn, helbet Kurdistan diji. Lê belê di nexşeyên (xarîte) siyasi da tenê yek nişanekê ji hûn nîkarin bîbin. Ev nav, ji aliyê tu organeke resmî va nehatiye qebûlkirin. Neteweyekî ku xwediyê gelekî 20 (bist) milyoni ye, ma gelo mafê wi yê hebûnê tune? Ev gel bî zorê hatiye mecbûrkirin ku bêdeng bîmine, û xwe veşêre. Ew wîsa hatiye bêçarekirin ku xwe ji tîrkan bêtir bike tîrk; lî Şamê bîkaribe kurdi qise bike; bîkaribe jiyana xwe bîdomîne lî Îraqê, yan ji lî Îrana Xumeynî serhildanên çekdari pêk bîne. Iro pîrsa kurdi tune tê hesabkirin, çimki kara tu hêzeke super di tîkîlbûna vê pîrsê da tune. Helbet ji dewletên îslamî yê fanatik, ji militarîzma tîrkî, ji faşîzma erebî ya partiya Baas û ji danûstandina şêxên petrolê ku lî Rohilata Nêzîk cîrit davêjin, kurd ji wê para xwe wernegirin! Kurd, di nava vi şerê berjewendiyê da ci nagrin, lê belê di binê wê da ci dîgrîn. Ji bo ku bîkaribe bî dengêki bîlind bike qêrîn û hewar dev û gewri têrê nake.

Aha di nav vê bêdengiyê da dengêki zelal bîlind dibe. Ev deng ji gotarekê (xîtab) bêtir; dengêki salîxdayînê, dengêki biranînê ye.


Lî Kurdîstana Tîrkîyê, ciyê ku lê hatiye

dînê, mezîneki malbata wi lî qeza Madenê ya ku lî ser tepekî 1000 metreyî bîlind yê ku ji axa lehi û laseran çêbûye hatiye avakirin, walîti kirîye. Jêra "Zaza efendî" gotîne. Navê wi yê rast Nuredin Zaza ye.

Nuredin Zaza vê gavê lî Bussignyê (Belediyeke paytextê Eyaleta Vaudê Lozanê) dimîne. Bî rojnamevan Gilberte Favre ra zewicîye, mamostetiyê dîke. Kurê wi Cango eynî wek zarokekî Vaudî dîçe mektebê. Lê bavê wi bîbaxşîn: lewra ew hina dîxwaze bî dil û can behsa zarotiya xwe, ya ku lî rojhilatê Tîrkîyê, lî ser girên bîlind derbas kirîye bike... Bêşik eger mirov ji bo dersgirtinekê, bî ronahiya iro lî rojên derbasbûyî bînihêre, pîr-hîndîk dibîne ku di wextê Împaratoriya Osmanî da, gelek xelkên cuda bî hev ra, di nav hev da, bî cîrantiyeke baş jiyane û di navbera wan da weke iro tu sinorên diyarkirî tunebûne. Wê demê dostaniyeke germ hebû di navbera kurdan û pîzmamên wan ên ermenî da, di navbera tîrkan û rûmên Trabzonê da, ku hingê ji bo ku di ocaxên madenê da bîxebîtin anîne Madenê. Hingê di navbera kurden Kurdîstana Bakur û birayên wan da, ne ji aliyê Mezopotamya yan ji Suriyê va, ne ji lî çiyayên navbera wan û deşta Cîzirê da tu sinor û dîritel tunebûn.

Lê, nijadperestîya tîrk ya ku di bin awirên erênî yê Ewrûpayê da her dîçû bîlîndtir dîbû, bû sedemê gelek felaketên mezîn di navbera gelan da. Aha N. Zaza lî ser êş û xîrabîyên ku lî welatê lê bûyî, û lî malbata wi bî xwe qewîmine tîne zîmên û lê şahîdiyê dîke.

Qîra Ermenîyan. Di sala 1919`an da, lî Madenê, lî taxa xelkê qetilkirî di xaniyekî xîrbe da keçîkek bî tena serê xwe tê ditîn. Ev keçîka sêwî wek xwişkêki tê mezînkirin. Lî gor Peymana Lozanê di sala 1923`an da gelên tîrk û yûnani bî hev dîhatin guhartin. Di pratîkê da tesîra vê bîryarê qewîrandina kolonîya yûnani ya lî Madenê bû. Herçîqas ji ew gelekî dîhatin hezkirin. Bî kurtî: ji hev qetendina insanan bî dîşewatîke mezîn bûbû rastiyeke malxerab... Dostê Nuredinê biçûk seyîs Kosma, ji vi welatê ku wek welatê xwe jê hez dîkir, bî darê zorê tê dûrxîstin. Dûra êdî dor tê xelkê bîncî yê vi welatî, ango kurdan. Kemal Atatürk ew xapandîna bî sozê ku ser-



N. Zaza (li piya û li ortê) di gel Kamuran Bedirxan û Ekrem Cemil Paşa

xwebûna Tirkîyê ji bo wan ji derbas bibe. Lê piştî sala 1925`a, sirgûn, di binê zor û tehdîtan da tirkîkîrîn, hepîskîrîn û kuştîna li dû hev dest pê kir. Û ev zulma han heta roja îro ji dom dike.

Ji malbata Zaza, kurê malê yê herî mezin ku bi meslekê xwe doktor bû, dewlet destûrê nadê ku li welatê xwe dokoriyê bike. Ew ji neçar dibe, birayê xwe yê biçûk bi xwe ra hildide û derbasi Suriyê dibe.

Nuredin piştî zîmanê tirkî vê carê dest pê dike zîmanên erebî, fransî û inglîzî ji fêr dibe. Hingê li Şamê û li Beyrûtê bi macîrên kurd ra bi hewes û hezkîrîneke mezin qîsekîrîna kurdi didomîne. Bi vi awayî çanda xwe ya xwerû, heta bi gihîje kûraya dewlemendiya wê, xwe berdide nav û jî nû va wê veçêdike.

Dî destpêkê da wek militanekî doza Kurdistanê û dûra jî wek lidereki wê xebatê dike. Ji bo ku hebûna Kurdistanê wek dewlet nebe jî -bêşik wek xewneke ku ancax di pêşda bê cihanin- lê qet nebe wek otonomî bê naskîrîn, jî mafê xwe-xwebûnê ra hurmet bê nişandan doza xwe pêşda tine. Evê yekê jî dema ku jî bo xwendinê derdikeve Awrûpayê, li wê derê bi riya derxistinê weşanên kurdi, wergerandina nivîsaran bi zîmanê kurdi, xwendin û perwerdekîrîna zîmanê kurdi, dike. Li wir Komela Xwendekarên Kurd vedike.

Nuredin Zaza, di sala 1956`an jî Zanîngeha Zanîstiyên Sosyal û Pedagojî yê diploma xwe distîne û mîna ku xwe bavêje devê gur, disa vedigere Suriyê. Li Suriyê Partiya Demokrat a Kurdistanê ava dike, loma jî dibe hedefa Nasîriyan, Partiya Baas û paşverûyên eraban. Dûra... girtî, bazdan, zindan, hevs û êşkence...

Aha tîştê ku "Jiyana min a kurdi" dîkî macereyeke bihnçikandinê ev in. Nivîskar di çîroka xwe da rûdirêjên Lubnanê, Iraq, Suriyê û Tirkîyê û herwisa

hevs, û dafikên mîşkan di zindanên van welatan da bi hev ra qîyas dike. Lê min; jî vê jî pêşdatir, di nav rûpelên kitêba wi da ku behsa koştê sax ku di vê rewşê da neçar maye, kêç û spi û bihna avdêsxaneyên pis dike, bihneke din ya geleki xweş his kir. Bi hna axeke (erdeki) kevn ya Rojhilatê, ku li ser mirovek dîlve... Miroveki Osmani, ku bi kelebçe yan jî bê kelebçe, li jiyana destgîrêdayî hatiye neçarkîrîn... - Dema ez dibêjim Osmani, bêguman mebesta min ew împaratoriye ya ku: têda di gel biratiya dinî û nijadî, li kuçên Beyrûtê, Helebê û Şamê, mîrxas û namerdan, hozan û fitnezanan, huqûkzanên çavtirsandî, şiiyan û kesên ku bi zîmanê siriak qîse dikin, durzî û asûriyan, memûrên ku jî bihtengiyê serxoş ketine û kulmên wan hertim jî bo lîxîstinê amade ne, wezîrên yekroji yên ku rojekê şûnda li ser qûna xwe dikevin dihêwirin. Di nav vê dehşeta mezin da, ku mijara kitêbê ye jî serî heta dawiyê, disa jî xuya ye ku ne xweşmêrî, ne jî bihna gûz, tîrî û hêjîran wînda bûne. Hemû van tîştan di dilê Nuredin Zaza da qet şopeke biçûk jî nehiştîye., N. Zaza yê ku li ser bedena wi şûna cop û xenceran heta nuha jî xuya dike, û îro hevvelatîyê Swîsrayê ye, bi aqlê-selim, bi des-tanên kurdi û comerdiya kurdan dagîrtîye. Îro çiqasî tari xuya bike jî, bi muzîka hêviyeke biçûk dilê wi disa jî xurt û qewî ye.

Werger ji tirkî: Haluk Öztürk



Çend gotinên bijarte...

Zanineke hindik xeterek e.
Ya ji kûraya kaniyê vexwe,
yan ji dev jê berde.
ALEKSANDER POPE

Yê bî aqıl dî xeberdana xwe
da hêdi ye û dî kîrîna xwe da
bî lez e.
KONFUÇYÛS

Mêrên mezin tu wextê xwe
mezin nabinin, mêrên piçûk ji
xwe piçûk nabinin.
GOTINEKE PÊŞIYAN YA
ÇINI

Ne mumkun e ku yek bîkaribe
ji bêmişûliyê tam tamê (lezetê)
bîstine heke zêde karê wi yê
kîrînê tunebe.
JEROME K. JEROME

Raman tu wextê nîkarin
sazûmana civaki ya kevin
bîguhûrin, tenê dîkarin rama-
nên sazûmana civaki ya kevin
bîguhûrin.
K. MARKS Û F. ENGELS

Siyasetvanek hîlbijartîna lî pêş
xwe dîfîkîre, lê miroveki
dewletê nivîşên pêş dîfîkîre.
JAMES F. CLARKE

Mirov heywaneki siyasi ye.
ARISTOTELES

Pirtûkên kevin ji bo nivîskarên
in; yê nû ji bo xwendevanan.
MONTESQUIEU

Dema mirov pîlîngeki dîkuje,
dîbêje sport e, lê dema pîlîng
bîxwaze wi bîkuje, dîbêje ho-
vîti ye.
G. BERNARD SHAW

Dîtînek ne hewce ye ku rast
be, tenê çîma ku hin kes xwe
dî ber da dîdîn kuştîn.
OSCAR WILDE

Ez ne hewqasi xort (genc) im
ku her tîştî bîzanîbîm.
OSCAR WILDE

Mirov tu wextê bî qasi fikrên
xwe, ne qenc, ne ji xîrab in.
J. MACKINTOSH

Herkes ji hafîza xwe ya xîrab
gazînan dîke, lê tûkes ji aqîlê
xwe gazînan nake.
FRANÇOIS DE LA ROCHE-
OUCAULD

YEKÊ GULANÊ TIM BI WE RA ME

Dîlê mîn bî we ra ye
Dî yekê gulanan da
Lî hemû welatân, hemû bajarên
Dîlê mîn bî we ra ye
Dema karberdanê
Dî meşên aşitîyê da
Xort, zarok û pirejîn
Dîlê mîn bî we ra ye
Pêşmergên serê çîyan
Karker û cotkar û şivan
Bî we ra têr im, bî we ra birçî
Lî govendê û lî şer
Û gava klaman dîbêjîn
Dengê mîn tevlê ye
Ku rojên azad hatin û şer gîha dawî
Ku çîyayên me bî agirên newrozê xemîlin
Ezê bî wera bîm disa
Dî avakîrîna rêyan û malan da
Dî danîna gulân da
Dema dasçîninê şevên havînan
Lî dîbîstanan û karxanan
Dî cejnên da, yekên gulânê
Vaye dîbînim şahîya milyonan
Kurdîstana azad û sosyalîst
Geş û gumreh û şên

1981

Kemal BURKAY

BA Û BAHÖZ

Bıla şadê mın bın
Xortên ku mina şıtîlekê ketın erdê
Loriya jınan û hêsrên çavên pıtıkan
Bıla şadê mın bın gundên melûl û dûr
Koziyên şıvanan
Xewên me ku heram bûn nivê şevan
Darên me û klamên me ku hatın bîrin
Çıyayên me yên camêr ku bı napalmê şewıtın
Û çend car sor herıkin
Munzurê kef û kopırık
Zapê din
Tûr û mûr bıla şadê mın bın

Dijmın!
Gora xwe baş bıkole
Bı hêrs e Kurdistan
Çıya û bani, dar û ber, çıvık û insan
Te ba ajot
Lı benda bahozê be

1982


Kemal BURKAY

KÛREYEKÎ EDEBİYATA BEDEW: *Kurteçirok*

Haluk ÖZTÜRK

Dî van salên dawin da, lî dervayî welat, xasma lî Swêdê edebiyata kurdi (Kurmanci û dîmilî) dî warê roman û kurteçirokê da bî awayekî şermoke û hîndîk be jî hêdi-hêdi rû dîde û dîgîhîje. Heta nuha xên jî kurteçirokên ku dî kovar û rojnameyan da hatîne weşandin, çend heb kitêbên kurteçirokan û roman jî derketîne. Bî vê yekê ra girêdayî, bîvê-nevê nîqaşa "roman-novel" û "romana kurt - kurteçiroka dîrêj" dî nav nîviskar û xwendevanên kurdi da dest pê kirîye.

Herçîqas ev nîqaş dî edebiyata Rojavayê da nîqaşeke kevn e jî, lê jî bo me gelekî nû ye. Bî rasti nuha dema nîqaşkirina vê pîrsê ye. Loma me jî



Lî jorê çend kitêbên kurteçirok û romanên xuya dîkîn. Dî nav wan da berhemên biyani yê ku bî kurmancî hatîne wergerandin jî hene.

pêwîst dît ku em lî vîr vê nîqaşê hînekî geştîr bîkîn.

Tîştê ku jî bo edebiyata me nû ye, helbet ne tenê jî hev cîhêkirîna şêweyên epîkê wek roman, çirok, kurteçirokê ye. Pîrsgrêkên dî jî hene. Yek jî wan pîrsa terminolojiyê ye. Wek nîmûne: termên ku em jî bo cîns û şêweyên edebî bî kar tinî ew jî hina standard nebûne. Ango dî terminolojiyê da tevlihevi û sergêjiyêke mezî heye. Mesele dî maneya novelê da gotîneke kifşkirî û standard hina tune. Lê gelek gotî hene, wek: "Kurteçirok", "çivanok", "novel" "hîkayet" "serpêhati" "Serborî" û hwd. (Hî jî vana dî maneyên dî da jî tîn xebîandî). Jî bo eynî maneyê yek, yan jî en zêde du navên standard hebî bes e. Gelo jî vana kijan bêtîr lêhati ye? Ev jî pîrsê nîqaşê ye. Lê em ê lî vêderê lî dûv bersîva vê pîrsê nekevî, jî mijara me der e; me tenê bî bir anî...

Mijara me wê kurteçirok (novel) be. Ango kurteçirok çî ye, çî nîne? Em ê hewl bîdî ku bersîva vê pîrsê dî roman û şîrovekirînen çend nîviskarên cihanê yê naskirî û kesên edebiyatnas da bigerî.

Kurteçirok çî ye?

Kurteçirok (novel) çî ye? Jî vê pîrsê ra bersîveke yekcûreyî tune. Dî nivê pêşî yê sedsala 14-an da nîviskarekî itali bî navê *Giovanni Boccaccio* ber-

ANTON ÇEXOV (1860-1904):
Yek ji niviskarên kurteçirokê yên
heri jêhati dî edebiyata cihanê da.



hevokeke kurteçirokan derxist. Wi ji ber devê çend keç û xortan bî qasi 100 hikayetên erotiki û rastbin guhdari kırıye û nivisandıye. Dî zımanê itali da jî van kurteçirokan ra *novella* hatiye gotin. (Dî eslê xwe da maneya *novella nûçe, xebera nû ye*). Jî wê çaxê heta nuha ev pirtûka han (*Decamerone*) wek destpêka kurteçirokê hatiye pejirandin.

Çawa ku jî navê wê jî diyar e, kurteçirok, çiroka kurt e. Baş e, madem wisa ye gelo wan hikayet û çirokên kurt yên ku jî edebiyata devki hatine berhev kırım û nivisandin, mese-la wek hın çirokên ku dî "*Hezar û yek Şev*" a erebi da hene, mirov dıkare wek novel hesab bike? Belê, lı gor edebiyatnasan mirov dıkare. Jı xwe hemû cûreyên edebiyata niviski dı destpêkê da jı kevneşopiya zargotınê zane (pey-da bûne). Zayına kurteçirokê jı wisa bûye. Dema çirokbêj jı çirokan derbasi behskırına jıyana rojane bûne hıngê hunera kurteçirokê peyda bûye. Nımûneyeke dın jı hın çirokên izlandi ne ku dı sedsala 13-an da hatine berhev kırım û nivisandin. Dı wan da şerên navbera kes û malbatên mezın, bûyerên mêrxasiyê, yan jı yên eviniyê hatine behskırın. İcar maneya xwe ew e ku, kevneşopiya novelê jı *Decamerone* ya itali jı kevıtır e. Pışti ku *Decamerone* belav bû, xasma lı İtalyayê û Fransayê gelek niviskaran dane ser rêça wê.

Kurteçirok pışti Ronesanıa Rojavayê, her çû bı pêşket. Bı wextê ra dı form û fonksiyona kurteçirokê da guhartın

çêbûne. Lê xasma dı nivê duwemin yê sedsala 19'an da, jı ali niviskarê fransi Guy de Maupassant (1850-1893) û Anton Çexov'ê ûris (1860-1904), hatiye nûjenkırım û pêşxıstın.

Kurteçirokek dıvê çawa be?

Diyarkırına sinorê navbera roman û kurteçirokê lı welatên Rojavayê jı mêj-da hatiye nıqaşkırım û hın xusûsiyetên wan yên bingehın hatine nişankırım. Lê disan jı carına kışandına sinorê navbera wan ne kareki hêsan e. Loma car heye ku eyni berhem dıkare lı gor hın kesan roman be, lı gor hınên dın novel be.

Belê novel jı romanê kurtır e, lê helbet ferq ne tenê dirêjayı û kurtayı ye. Pırı caran dı kurteçirokê da jimara bûyerên cuda gelekı sinorkırı ye. Gelek novel berê xwe dıdın tenê ser yek bûyerekê yan jı nakokıyekê. Û galerıya kesan lı gor romanê dı novelê da hindıktır e. Herçıqas şêwe û metodên behskırınê dı roman û novelê da wek hev bın jı, lê çawa ku dı romanê da de-

tay derdikevin pêş, dı novelê da wisa zêde ji detayên biçûk ra ci tune. Û taswirkirina fireh ya dorûberê û analiza fireh ya karakterên kes û lehengên wê nayê kırım. Ji aliyeki va ji kurteçirok dişibe dramayê, çimki niviskarên novelan piri caran behsa tişteki dramatikî

"*EGER dı beşê pêşin yê çirokekê da, LI DÎWÊR TIFINGEK DALIQANDİ be, gerek e ew tifing dı dawiya çirokê da esse bê agirkırm*". Ev şireteke hostayeki mezin yê novelê Anton Çexov e, ji bo kesên ku dixwazın kurteçirokan binivisın.

"*EGER dı beşê pêşin yê çirokekê da, LI DÎWÊR TIFINGEK DALIQANDİ be, gerek e ew tifing dı dawiya çirokê da esse bê agirkırm*".

Anton Çexov

dıkin û jimara kesên kêm e.

Derheq çawabûna kurteçirokê da, niviskarên mezin wek Goethe, Edgar Allan Poe, Guy de Maupassant, Anton Çexov dı wextê da raya xwe dane xuyakırın. Mesela Li gor niviskarê alman Goethe (1749-1832), dı kurteçirokekê da, *dwê bûyereke sinorkiri bête dayin û guhartineke wisa ecâib çêbibe ku bı wê ra karakterê kesên bête ronikırın. Novel gerek e li ser jiyana rojane bête bilındkırın û behsa qewmandineke mezin bike.*

Guy de Maupassant hostatiya xwe bı sinorkırına çarçova çirokê û dawianina wê ya geleki bı tesir dıde xuyan. Dı dawiya gelek novelên wi da xwendevan ecêbmayi dımine û çirok bı nişana balkêşiyê (!) temam dıbe. Ji vi ali va ew û hostayê mezin Anton Çexov geleki ji hev dır in. Çexov bêtır bı dawiyeye vekiri çirokên xwe dıqedine, çirok bı nişana ramandanê (...) temam dıbe. Ew ji jiyane parçeyeki dıde ku tê da ne detspêk ne ji dawiyeye.

Hostayên novelê Anton Çexov û Edgar Allan Poe (1809-1849) yê Amerikani bı şiretên xwe yên li ser hunera kurteçirokê, heta nuha ji ji niviskarên kurteçirokê yên baş ra rêberiyê dıkin.

Beri Çexov, Edgar Allan Poe ditineke geleki nêziki vê ditinê pêşda aniye. Li gor wi *kurteçirok çirokek e ku pêwist e mirov wê dı çarçoveyeye wisa biçûk da behs bike ku têda ci tunebe ji bo gotmên vala yên ku ji bo çirokê ne giring in. Eger li wir, dı dekorê da tişteki bê mane hebe, gerek e ew derhal bigihije maneyekê beri ku çirok biqede. Ne xwe gerek e ciyê wi tune be li wê derê.*

Ji niviskarên swêdi yên naskiri Ivan Lo-Johansson ji li ser ferqeke kurteçirok û romanê da van gotinan dibêje: "*Veşartina ecemitiyê yan ji hileyê li gor romaneke sist, dı kurteçirokeki da zortir û diwartir e.*"

Çavkani:

- Världens bästa Noveller i urval, Natur och kultur, 1978 Stockholm.
- Levande Litteratur från Gilgamesj till Bob Dylan, Tore Zetterholm, 1981.
- Litteratur orientering, Natur och Kultur, 1983 Stockholm.
- Svenskböckerna, Litteraturkunska, 1982 Sockholm.
- K. Gariboglu, Edebiyat bilgileri, batıda ve bizde ed. akımlar, 1979 İst.

PEXŞANA KURDI YA HUNERÎ (1)

Ferhad Shakely

1- PAŞKOKA DÎROKÎ Û BIYOĞRAFIK

A- Pexşana Kevin

Şîer dî edebiyata Kurdi da bî sedşan şaxeke sereke bûye. Cara pêşi dî destpêka sedşan 19-an da wek pexşan dertê holê. Tevî ku jî vê serdemê minak kêr in jî, jî bo nişandana serdema novela Kurdi minakên girîng in. Dî vê babetê da tişteki girîng heye ku meriv bal bixşîne serê, hemû zanînan derbarî destpêka pexşana Kurdi da, şîer an jî novela Kurdi kare bête guhartin jî ber ku lêkolîna edebiyatê bî rewşa siyasî va girêdayî ye. Wek minak heta sala 1970 wisa dihatê bawerkirin ku, nivîsara pexşan a Kurdi ya herî kevn jî alî Şêx Huseyn Qazî hatîye

nivîsandin, lê nivîsareke nivîskar Muhammed Mela Kerim (1981) nişan dide ku, pexşana Kurdi jî diroka ku meriv pê bawer bû 40 sal kevtir e. Ev guhurin jî bo novela Kurdi jî derbas dibe.

Ew pexşanên Kurdi yên ku di vê qonaxê da girîng in, ev in :

1) "Aqiday Kurdi". Evya teksteke dinî ye û jî alî Mewlana Xalîd Naqşibendî Şarezûrî (1779 - 1827) hatîye nivîsandin. Dî vê tekstê da, ku Mewlana hîm bî navê "Aqidanameyî Kurdi" hîm jî bî navê "Aqidayî Kurdi" bî nav kirîye, Mewlana bîngeha îslamî rawe kirîye. Wisa xuyaye ku Mewlana vê tekstê bî armanca ku wek pirtûka perwerdegarîyê bête bî kar anîn nivîsiye. Tekst cara pêşi dî 1981 da hatîye weşandin. (1)

2) "Mewlûdname". Jî alî Şêx Huseyn

Qazi (1790 - 1869) hatiye nivisandin. Ev çirok derheqa, mezin bûn, jiyan û şerên Muhemmed pêxember da ye. Tekst xwedi hunermendiyeke bilind e û bî zimaneki kubar hatiye nivisandin. Li mizgeftên Kurdistanê wek pirtûka perwerdekîrîna hatiye bî kar anin. Cara pêşi dî 1935 (2) da hatiye çap kîrîn.

3) "Adet û Rusûmatnameya Akradiya". Jî ali Mele Mahmûd Bayazîdî (1797 - 1858) va hatiye nivisandin. Tekst, derbarî urf û adetên civata Kurd da nivisareke antropolojîk e û xwedi kalîteyeke edebî ye. Ev tekst, yek jî wan tekstên Bayazîdî dî sala 1860 da daye rojhilatnasê (orîentalîst) Rûsî August Jaba (1801-1894). Tekst wek dest-nivisarek li Leningradê (navê kevî, Petrograd) hatiye parastin û cara pêşi dî 1963 da jî ali Kurdologa rehmetî Margareta Rûdenkon (3) hatiye çap kîrîn.

4) "Tavarîx-î Qadîm-î Kurdistan". Jî ali Mele Mahmûd Bayazîdî va hatiye nivisandin. Evya kurteraweveke "Şerefname" ya Şeref-xan Bedlîsî (1543 - 1604) ye. Bayazîdî vê teksta han jî daye Jaba. Cara pêşi dî 1986 da hatiye weşandin. (4)

5) "Peymana Nû". Evya wergêra tema-mîya Incîlê ya bî Kurdî ye. Dî sala 1872 da li Istenbolê hatiye çap kîrîn. Dîvê bête xuyan ku ev wergêr bî alfabe ya Ermenî hatiye nivisandin. (5)

B- Rojnamevani


Dî nivêka sedsala 19-an da li Kurdistanê, ku dî bin hukmê Osmaniyan da bû, gelek xwendegeh hatine vekîrîn. Armanca xwendegehên Ruşdiye, perwerdekîrîna eskeran bû, lê tevî wî jî bî saya van xwendegehan gelek cîwanên Kurd piştî çûne Istenbolê da ku xwendina xwe bîdomînin. Wê demê Istenbol jî bo ronakbîr û aktivîstên siyasi yê xelkên cuda ên împaratoriya Osmani, nawendeke gîring a kul-

turî û siyasi bû. Li gel wan xwendegehên resmî xwendegehên dinî, ango mîzgeftan jî, dî belavbûna ilm, perwerdekîrîna cîwanan û parastina çand û zîmanê Kurdî da roleke gîring dîleyîst. (6)

Dî dawîya sedsala 19-an da Istenbol jî bo xwendevanan bû cîhê kombûnê, mamûrên dewletê yê meqamê bilind û siyasetvanan (7). Ev rewşa han gîha derketina insanên zana û intelektuel ên bîjare (elit) ku xwedi daxwaziyeke bilind bûn bo nasîna pêşketînen kulture yê Istenbolê û pêra jî kulture û sîvilîzasyona Ewrûpî. Dî navbera salên 1830-70 da li dû hev gelek serhîldanên Kurd bî ser neketin. Ev grûba bîjare jî bo organizekîrîna û metoda têkoşîneki nû li dû zanîna gerîya. dî vê navberê da jî bo derxistina rojnameyên Kurdî fikîrîna û hewl dan.

Rejîma Sultan Abdulhemîd, ku dî 1876 da hate ser hukûm, xwînrij, rîziyayî, ruşwetxwar û zordest bû. Sultan li dij hemû cûre reform, demokrate û azadiyan bû. Ev rewş bû sedem ku li Istenbolê rojname Kurdî ya pêşi neyê weşandin. Hejmara yekem a rojnameya "Kurdistan" dî 22 yê 1898 da li Kahîreyê ango li serbajarê Mîsîrê, jî ali Mîqdad Mîdhat Bedîrxan va hate weşandin. Lê li Kahîreyê jî, rojnameya Kurdistan jî tade û zulma Tîrkan nefîlî. Dî navbera Nîsana 1898 û Nîsana 1902 da 31 hejmarên rojnameyê li bajarên cuda derçûn: Kahîre, Cenevre, Kahîre, London, Folkstone û Cenevre (8). Rojnameya Kurdistan, destpêka nûçevanîyê destnîşan dîke û piştî ev rojname bî sedan rojname û kovarên Kurdî, him li Kurdistan him jî li dervayî welat, hatin weşandin.

Piştî rawestandîna Şerê Cihanê yê Yekem û hilweşandîna împaratoriya Osmani ew ronakbîrên bîjare, ku Istenbol jî xwe ra kîrîbûn nawendeke, vejerîyan Kurdîstana Iraqê. Dî vê beşa



Faktoreki giring ji bo derketina novela Kurdi, rojnamegeriya Kurdi ye.

Kurdistanê da Şêx Mehmûd Hafid (1882 - 1956) du periyodan hukumdariya Kurdistanê bî rêve bîr (Çiriya Pêşin 1918 - Heziran 1919 û Kanûn 1922 - Tirmeh 1924). Dî vê dewleta Kurd a serbixwe da û piştî, piştî ku Kurdistanê Başûr ji ali dewleta nûsazkiri ya Iraqê va hate dagirtin, rojnamegeriya Kurdi pêşketineke mezin nişan da. Perwerdegariya bî zîmanê Kurdi serbest bû. Dema ku Kurdistan hate zêft kirin, perwerdegari yek ji wan şertan bû. Dî van şertên nû da intelektualên Kurd ên bijare gelek çalakîyan li dar xistin, û ji bo rola giring a ku Kurdistanê wergirt bingehê danin. Pêşketinên rojnamegeri bandor li ser hunera novel kir. Destpêka novela Kurdi encameke rasterast ê rojnamegeriya Kurdi bû.

C- Hunera çiroknivîsinê ya nûjen

1) Destpêka destelepki

(1913 - 1939)

Her keseki ku bî awayeki li ser novela Kurdi rawestiyaye, dibine ku ev destpêk bî edebiyata Ewrûpi va girêdayi ye. Şirovekirineke weha kare bo gelên dîn ên Rojhilatê ji derbas bibe. Sedemê viya ew e, ku iro em wek novel bî nav dîkî, hunereke Ewrûpi ye ku bî riya wergêran gihîştîye gelên Rojhilatê û piştî li ser edebiyata wan

bandor peyda kirîye.

Pêwendiya niviskarên Kurd bî edebiyat û rojnamegeriya Ewrûpi ra bî Tîrki, Farîsi yan ji Erebi çêbû, ji ber ku rojnamegeriya Kurdi cara pêşî dî dawîya sedsala 19 da derket holê, çawa ku pirtûkên Kurdi cara pêşî dî dawîya sala 1910 da hate çap kirin (9). Umar Marûf Berzenci dibêje ku, "dî destpêka vê sedsalê da ji bo niviskar û intelektualên Kurd, zîman û edebiyata biyani çavkaniya ilhamê bû, xasîma edebiyata Farîsi û Tîrki. Û ev hilbijartî li ser stil û mijarên wan bandor çêkir" (10)

Piştî rabûna hukmê Mirîtiya Baban û hukumdariya heyî, nêzi Şerê Cihanê yê Yekem Kurdistan bû parçeki împaratoriya Osmanî, loma zîmanê Tîrki û edebiyata Tîrki bû serdestê jiyana kulturi. Dî çend xwendegên dewleti da perwerdegari bî zîmanê Tîrki bû. Çend niviskar û intelektualên Kurd ên heyî zanîna xwe bî riya zîmanê Tîrki wergirtin. Kurteraweya Dr. Marîf Xaznadar: "Piştî Şerê Cihanê yê yekem dema ku novela Kurdi derket holê, novelistên Kurd ji bo nivîsandina romanên bê tecrube bûn. Çavkaniya zanîna wan, bî taybetî li Kurdistanê Başûr, gere novelên Tîrki yan ji novelên Ewrûpi yê wergêra bî Tîrki bûna". (11)

Bêguman faktoreki giring ji bo derketina novela Kurdi, rojnamegeriya Kurdi ye. Kovar û rojnameyên Kurdi,

ligel rola xwe ya belavkariya ilm û zanina politik, ji bo pêşveçûna kulturî cihêki girîng digre. Ji ber vê yekê ye ku Umar Marûf Berzenci kare bêje, "derketina novela Kurdi yekser bi destpêka rojname û kovarên Kurdi va girêdayi ye." (12) Gava meriv pê dîhese ku di navbera salên 1925-27 da ji 1100 novelên weşandi 800 novel di rojname û kovaran da hatine weşandin, ev rasti zelal dibê. Ev tê wê maneyê ku, novelên Kurdi û imkana belavbûna wan bi rojnamegeriya Kurdi va girêdayi ye." (13)

Pevgirêdana navbera rojnamegerî û novel tenê pîrsa kulturî û diroki nîne, her wisa di dereceyêki da pîrsa teknîk e. Şiêr, ku şaxeke sereke bû, bi lez belav dibû, lewra insan wan şîeran karibûn jiber bîkîrana û bixwendana. Lê dema novel bîkeve rojevê, rewş çihê bû. Ji ber form û dirêjahiyê divê novel bihatana nivisandin û weşandin.

Gava meriv wan novelên vê pengavê dixweyne, dibîne ku ji mirata çirok û şîera folklorîk a gelêrî ya dewlemend benekî dîkîşe nava novela Kurdi ya nûjen (modern). Bandora çirokên kevnepî di zîman û avahiya (struktur) novelan da tê xuyan. Derbarî vê pîrsê da Dr. I. M. Rasûl dibêje ku: "Novela Kurdi ya nûjen tenê neqîlkîrîna edebiyata Ewrûpî ji nîne, lê tîkelkîrîneke afirandêr û dewlemend a mirata zargotîni û nivîskî ya gelê me û şeweya gotîne ya gelên din e." (14)

Ditina min ew e ku, di pengava yekem da bandora folklorê ji bandora novelên Ewrûpî xurttir e. Di hînin minakan da meriv ji çirok û raweyên kevnepî û domandîna wan texlîdkîrînek vekîrî dibîne. Herweha meriv nîkare îspat bîke ku nivîskarên vê serdemê hunera novela Ewrûpî nas kîrîne, di wergêran da ji rewş weha ye. Di vê serdemê da tu novelekî bi zîmanê Kurdi nehatiye wergêrandin. Wergêrên

novelan ên pêşî di destpêka sala 1940 da hatiye kîrîn û bandora wan di vê pengavê da yan ji di pengava dûhati da (ku ez ê piştî rawe bîkîm) di novelan da tê xuyan.

Novelên vê periyodê, ku di gîhîje serîya 27 salan, bi gîştî destpêka destelepki nişan dîde. Form û naveroka wan di sewiyeyên cuda da ne. Ji bo viya ji, divê meriv paşkoka kulturî û politik a novelistan binîhêre.

Heta sala 1980 meriv di hemû lêgerînan da dibîne ku destpêka novelên Kurdi 1925 bûye, lê di Rojî Kurd da ji, ku ji nû va hatin çapkirin, diroka destpêkê 13 sal paşva diçe. Di hejmarî 1 û 2'yan ya vê kovarê da bi navê Çirok-Fuad Tamo- novelek heye. (15) Di dawîya beşa duduyan da, ku di hejmarî 2'yan da hatiye weşandin, tê gotin ku "dûmahîk heye", lê di hejmarên dû da dumahîka vê novelê tune. Novela ku ji sê rûpelan pêk tê bi hemû awayî teksteke xirab e û xirabîya tekstê tenê ji ber weşandîna yekem e. Ji bli viya tu qezencekî ji novela Kurdi ra çênekîrîye.

Piştî vê novelê cara pêşî di sala 1925 da meriv kare noveleke Kurdi bixweyne, ango "La Xawma" - Cemil Saîb (1887-1951), ku bi rasti wek himdarê novela Kurdi ya bi huner tê hesab kîrîn. Ev novela han pêşî wek tefrîqa di rojnameya Jîyanawa û paşê di rojnameya Jîyan da hate weşandin. Ev novel di nav periyoda 1.7.1925 - 29.7.1926 da wek 23 beş hate weşandin (18 beş di Jîyanawa da, 5 beş ji di Jîyan da) (16). Di beşa dawî da tê gotin ku dumahîk heye. Tevî ku nivîskar piştî weşana vê novelê gelek sal li jîyanê ma ji, wi çî novelên nû nivîsi û çî ji wê novelê wek pirtûk çap kîr. Cara pêşî 1975'an da, di pêncî salîya weşandîna yekem da, ev novel ji alî Jamal Baban va wek pirtûk hate çap kîrîn. (17)

Gelek lêkolinvan ji ber sedemê ka di beşa dawî da çî heye, vê novelê wek nivcû dihesibîne. Tu dumahik berde-wam nekîr, tevi ku weşandina rojna-meyê berde-wam ji kîr. Di 1975'an da wek pirtûk çapkîrîna vê novelê ji destnîvisarên nivîskar hate ava kîrîn, lê li wê derê ji tu zêdayî lê nehatiye kîrîn. Ez bawer im ku nivîskar bî zanebûn xwe ji domandina vê novelê dûr xîst û pêra ji bî zerafeteke mezin wi diyari kîr.

Nivîskar ji bo temankîrîna çîroka xwe karîbû hevokê bî tenê lê zêde bîkîra. Çîrokbêjê novelê wek nîmûne karîbû bigota ez wê demê şîyar bûm. Ku

Novela bî huner bî tînaz berê xwe daye hukûmdarê pêşî û diroka nûjen ya hukûmdariya pêşî ya serbixwe ya Kurdîstanê. Cemil Saîb naveroka tema-miya çîrokê li ser serdema Şêx Mehmûd Hafîd nivîsiye, êrişê wi kîriye, dewra wi wek dîktatoriyeke xwinrij -yan ji xewneke pis- nişan daye. Ev dijminahiya hukûmdarê Kurdîstana Başûr, ku Şêx Mehmûd hatiye bî nav kîrîn, ji sedemên cihê yê şexsi û faktorên siyasi çê bûne, ku pêwîst nîne em li vê derê bî kûrahi li ser bîsekînin. Di rojnameya Jiyanawa da weşandina vê nivîsarê hîn rastiyan rawe dîke. Li gor agahdariyên H. Arîf, ev rojname yek ji wan dezgehên bû ku bo Britanyaya Mezin propagande bîke. Rûpelên rojnameyê bî nivîsarên derba-ri Britanyaya Mezin û qaşo merhemeta wan û parastina mafên Kurdan dagîrti bû. (18)

Celadet Ali Bedîrxan (1893-1951), zîmanzan û rojnamevaneki aktiv bû. Wi hemû jiyana xwe da xebata pêşveçûna kultura Kurdi li ciwarên cuda. Wi kovara Hawar derxist. Di hejmara 4'an da Bedîrxan nivîsarek bî navê "Ber Tevna Mahfûre" weşand ku di literatura Kurdi da yek ji wan

nivîsarên pêşîn e, lê ne ya herî baş e, dema ku zîman, form an ji naverok bîkeve rojevê. Di vê nivîsarê da Bedîrxan sedemên têkçûna Serhîldana Şêx Seîd a 1925'an rawe dîke. Nuqte-yeki vekîri ya vê nivîsarê dîlpakiya siyasi ye û baweriya ku Kurd xwe per-werde bîkîr, zanînê bî dest xîr û bî ga-vên qewî berbî azadiyê bîmeşîn. (19)

Çîroka "meseleyî Wijdan" a ku ji alî Ahmed Muxtar Jaf (1897-1935) hatiye nivîsandin, di nav nivîsarên vê serdemê da ya herî serketî ye. Ev di diroka ede-biyata Kurdi da cihê xwe yê rasti negîrtîye, ji ber ku ew di sala 1927-28 da hate nivîsandin û heta sala 1970 wek destnîvisar di cih da ma û wek pirtûk di vê salê da hat çap kîrîn (20). A.M.Jaf heta sala 1970 wek şaireki welatperwer dihat nas kîrîn, lê bî weşandina çîrokê ew ji wek çîroknivîseki hosta û aqilmend xuya bû. Ev çîrok ji, wek a Saîb nivcû ye, lê zîncira bûyeran nişan dide ku ew çîrok dirêjtir bûye. Wîsa xuyaye ku, nivîskar nîkarîbûye çîrokê temam bîke.

Berevajiyê çîroka Saîb, "Meseleyî Wijdan" çîrokeke şoreşger û radikal e. Nivîskar li hember sazîyên dewletê û rêvebiran rexnegîreki qewî ye. Ew, sis-tema brokratîk a rîziyayî ya ku kolon-yalistên Îngîlîzî pîştî rûxandina huku-meta Saîx Mahmûd li Kurdîstanê bî cih kîrîbûn derdixe meydanê û mehkûm dîke. Li alî din di nav nerehe-tî û dijberîya feqîr, xelkê zordîtî, gundî û rêvebirên diz û rîziyayî, axayên feo-dal ên zordest û xedar da A.M.Jaf bê dudilî aliyê xelkê hîlbijart. Ramanê wi gelek giranbîhatir e, wek ku em dîzanin ew mir bû û kurê Osman Paşa Jaf bû. Ew girêdayî eynî rêvebiriyê bû, wek Qaim-maqamê Helebçe. Şoreşgerî û welatheziya A.M.Jaf di şîrên wi da ji bî awayeki vekîri cih girt.

Pîremêrdê şair (1867-1950), şarezayê pîralî yê intelektuel di sedsala 19 da di

gelek waran da çalak û pêşeng bû: rojnamevan, wergêrvan, şair, niviskarê piyes û folklorist. Wi gelek pexşan ji nivisi. Piremerd ji bo pexşanên xwe mijareki hîlbijart ku ew mijar ji yê niviskarên din cudatir bû, ango pexşanên diroki. Berhemên wi yê di-roki ji "Duwanzde Suwaray Meriwan" û "Mem û Zin" pêk tê (21). Ji xeyni van herdu berhemên çend novelên wi ji di salên 1930-40 da di rojname û kovaran da hatin weşandin, lê ew tu car wek pirtûk nehatin çap kirin.

Ji vê serdemê çirokniviseki din ji Muhammed Ali Kurdi (1898-1957) ye, ku di nîveka 1930 da çirokek û romanek weşandiye: Çiroka "Duway Sarxoşî Zor Şêti ye" di antolojiya "Diyari Lawan" (1934) da û romana "Nazdar" ya ku tenê sê beşê wê di kovara Ronaki da, hatine weşandin (1936). Kovar hate qedexekirin û lewra ji dumahika romana M.A.Kurdi nehat. Heta niha ji tu destnîvisar (a wê romanê) nehatine ditin. (22)

2- Nîfşa Gelawêj (1939-49)

Di sala 1939 û heta dawiya Şerê Cihanê yê Duyem çalakiyên politik ên pêşketi hebûn. Li Kurdistanê Iraqê partiya Hiwa û piştê Partiya Demokrat a Kurdistan hate damezrandin, û li Kurdistanê Iranê pêşi J.K. û piştê Partiya Demokrat a Kurdistan hatin damezrandin. Lûtkeya (cihê heri bilind) van çalakiyan serhildana Barzani (1933-34, -43, -45) û sazîrana Komara Demokratîk a Kurdistan a Mehabad (1946) bû. Di vê serdemê da kultura Kurdi ji gelek xurt bû. Di destpêka 1930 da çend niviskarên Kurd û xwendevanên Baxdadê antolojiyek edebiyatê weşandin: "Yadgari Lawan" (1933) û "Diyari Lawan" (1934). Komele û sazîyên kulture û politik hatin damezrandin. Di Kanûna 1939 da hejmar

yeki ya Gelawêj hate weşandin, ku heta dema me ya iroyin ji ev kovar a heri baş e û bi naveroka xwe ya heri dewlemend tê ditin. Gelawêj, ku heta 1949 hate weşandin, ji bo pêşveçûna novelên Kurdi xwedi ciheki mezîn û bi mane bû.

Li Kurdistanê Iran, J.K. û Komara Kurdi xwedi du armancan bûn : Pêşvebirina insanan û kulture. Ji 1940 heta rûxandina Komara Mehabad (1946), gelek rojname, kovar û pirtûk hatin çap kirin.

Ji bo Kurda bîkşînî ba xwe û ji bo ku pêşîya komunizmê bigrin da ku Kurd nekevin bin bandora wi, kolonyalistên Îngilîz û Fransîz dest pê kirin û bal kişandin ser kultura Kurdi û zîmanê Kurdi wek navgînek propagandayê bi kar anin. Li Iraqê balyozxana Îngilîzi kovara "Dangi Geti Taza" (1943-47) weşand, li Filistinê di weşanxaneyê Radyoya Rojhilat da beşa Kurdi çêkirin. Li Sûriyê û Lubnanê, ji bo derçûna çend rojnameyên Kurdi Fransîzan rê da. Armanca hin ji wan rojnameyan propagandeya qewetên hevkar (aliyan) û weşandina nûçeyên şer bû : Hawar (1932-43), Ronahi (1942-45), Roja Nû (1943-45) û Sîtêr (1943-45).

Rojnameya Gelawêj deh salê weşana xwe kir bîngeh ji bo çirok û nîvisarên nûjen ên Kurdi. Xwediye rojnameyê û redaktor bi zanebûn ji bo pêşvebirina nîvisarên Kurdi xebitîn. Ji alîki va ji rê dan wergêrandina novelên biyani bi zîmanê Kurdi. Di 105 hejmarên rojnameyê da, ku di deh salan da hatin weşandin, 114 novel hatin weşandin, 82 novel hatibûn wergêrandin û 32 novel ji ji alî niviskarên Kurd va hatibûn nîvisandin. (23)

Berhemên niviskarên heri navdar di Gelawêj da hatin wergêrandin û weşandin, wek Guy de Maupassant,

Oskar Wilde, Honore de Balzac, Anton Çehov, Maksim Gorki, Leo Tolstoy û Ilya Ehrenbûrg. Dî eyî demê da Piremerdê şair romana "Kemanist" (H.C.Andersen) jî Tîrki wergêrand Kurdi û dî 1942 da weşand. Şair Goran (1904-62), ku dî serdema şer da lî weşanxaneyê radyoya Kurdi ya Jaffa xebiti, gelek novel wergêrandin Kurdi û ew dî radyoyê da xwendin. Piştî wek pirtûk çap bû (1953). Dî pêşgotina vê antolojiyê da, ku jî 9 novelan pêktê, Goran armanca xwe ya wergêran dîde xuyan : "Armanca min ew bû ku bî riya weşanên radyoyê yarmetiya rojnameya Gelawêj bikim û bîngehek jî bo pêşveçûna hunera novela Kurdi deynim. Wek niviskarê Ge-

lawêj baweriya min ew bû ku riya heri kurtebir jî bo armanca wergêrandina çend novelên bî zîmanê biyani bûn." (24)

Jî xeynî vana çend niviskarên dî yê nîşa Gelawêj jî hene. Dî nav wan da yê heri naskirî : Aladdin Seccadi, Ibrahim Ahmed (çapemen û redaktorê rojnameyê) Şakir Fettah. Hersê niviskar jî, jî bo novelên xwe mijarên wek hev hildibjêrin, lê dema ku ditîna çareseriyên pîrsgirêkan û gihîştina encaman dîkeve holê, ew ne wek hev in.

Dûmahik heye

Wergêr : A. GERNAS

Têbînî :

- 1) Muhammed Mela Kerim : "Aqiday Kurdi Mewlana Xalidi Naqşibendi", Govari Kori Zanyari Iraq, Dastay Kurd" 8 (1981), rûp. 199 - 222
- 2) Qazi, H. : "Mewlûdnama", Baxdad 1935.
- 3) Mela Mahmûd Bayazidi : "Adet û Rusûmatnama ye Akradiya" (ed. M.B. Rudenko), Moskova 1963
- 4) Mela Mahmûd Bayazidi : "Tavarihi Qadimi Kurdistan" (jî ali K.K.Kurdoev û J.S. Musaelian hatine weşandin) Moskova 1986
- 5) Peymana Nû, Istenbol 1872
- 6) Kemal Mazhar Ahmed (Dr) : "Tegayîştîni Rasti, Baxdad 1978
- 7) Ibid, rûp. 51
- 8) Ibid, rûp. 66
- 9) Nariman : Bibliografya-y Kitêb-i Kurdi, Baxdad 1977, rûp. 4
- 10) Umar Marûf Berzenci : Lêkolînawa û bibliyografyay Çiroki Kurdi (1925 - 1969), Akademiya Zanyari ya Kurdi, Baxdad 1978, rûp. 30
- 11) Çiroki Halbizharda, dî Rojî Kurdîstan da hatîye weşandin, 1976, rûp. 7

- 12) Berzenci, rûp. 9
- 13) Nûr aldin Muhammed Said : "Al-Qiassa Al Kurdiya Fi Multaqa Salah ul-Din. Al Iraq, 28 ê Gulanê 1978
- 14) Dr. İzz Al-Din Mustafa Rasûl : "Ara Fi Al-Qiassa Al-Kurdiya," Al-Aqlam, 19 (1984) : hejmar 2-3, rûp. 113
- 15) Jamal Xaznadar (çapemen) : "Rojî Kurd", Baxdad 1981
- 16) Huseyn Arîf : "Çiroki Huneri Kurdi" (1925-60), Baxdad 1977, rûp. 14
- 17) Cemil Saib : "La Xawma", jî ali Cemal Baban hatîye weşandin, Baxdad 1975
- 18) Huseyn arîf, rûp. 15
- 19) J.A.Bedirxan : "Ber tevna Mehfûre", Hawar, 4 ê Tirmeh 1932, rûp. 1-4
- 20) Ahmed Muxtar Jaf : "Masallay Wijdan", jî ali Dr, Ihsan Fuad hatîye weşandin, Baxdad 1970
- 21) Piremerd : "Duwanza Suwaray Mariwan", Suleymani 1935, 1959; "Mem û Zin", Suleymani 1934, 1981
- 22) Arîf, rûp. 45
- 23) Arîf, rûp. 56-57
- 24) Goran : "Halbizharda la Çiroki Kurtî Bêgana, Baxdad 1953

JINEK KU ESMAN SERÊ XWE JÊ RE BIHINGIVINE

Derûn

*westiyayi, bêdengûreng e,
bı gunehan perjin e,
qêrina birindaran, kuştıyan
lı ser kom bûye.*

Husên HEBEŞ

Derûn

*bêpejn e,
dêbavên nûkuşti;
hawarên zaroyên lişwinmayi
xwina wê ditevizinin,
wê dımırmırinin.*

Loqmanê Hekim!

Tu kari dermaneki bîbini

û derûnê rizgarki?;

Em ê çi bîkın

- eger em bê derûn bîminin!

- Helbestvanek

ku bı zımanê êgir bızane

û barovan bîkedine,

yan

jinek

ku esman ji ber mirovatıya wê bervê were

û serê xwe jê re bihingivine.

3. 1. 1995

BILBILÊ MIN ÎRO PARSÊ DIKE (*)

Jî jorve xweş tê awazên bilbil
Kul û derd û xem bardike ji dîl
Bî dengê bilbil hinbûm vîyanê
Jî rengê bilbil hinbûm jîyanê
Evinê dîde, tirêjên rojê
Cerg û hinavan, lî min dîsojê
Ber serê min ayetan dixwine
Jî dêvla hêsrên xwinê dirjine

Ehmed TEWFIQ

Dem dîçe û tê, daketîm bajêr
Bilbilê melûl, destê wî lî jêr
Ew parsê dîke jî xêrnexwazan
Kes goh lê nake bî van awazan
Zuwa bû jî deng, zingilê zêrin
Gul û çiçek û nêrgîz çilmîsin
Erê! dunya jî kesir namîne
Lê dengê bilbil hertîm dîmine

(*) Dengbêjeki kurd bî navê Reşîdê Kîmê, dî van demên xwe yê dawî de lî bajarê Nuseybinê parsê dîke. Mî ev serpêhatiya vî dengbêji jî xûşka Şaneşîn bîhist. Ez jî van çend rêzên xwe yê jorin dîyari wê dîkîm.

Hevpeyvînek bî Evdîlayê Mela Reşîd ra:

LI SER ŞIROVEKIRINA "MEM Û ZIN" `ê

Hevpeyvî: Vazgal BAZIDÎ

ROJA NÛ: *Em pê dîzanin ku tu ji malbeteke dîndar û welatparêz i. Beri ku em derheqê Ehmedê Xani û berhemên wi da guhdariya ditmên te bikin, tu ji kerema xwe ra dîkari bî çend gotinan xwe bî xwendevanan bîdi nasin?...*

E. M. REŞID: Ez ji yek ji wan Kurdan im ku ji ber dijmin bazdane û hatine Sûriyê. Dî Kurdistan bîndestê Tirkîyê da em hatine welatê Xerza. Pêşiyê em li gundê Arincê bûn, bavê min li wê derê çêbûye. Navê eşira me Rindoyi ye. Dî wi welati da bavê min bî navê Mela Reşîd hatiye nasinê. Lî Xerza dibêjin Mela Reşîdê Arinci. Lî derva dibêjin Mela Reşîdê Xerzi. Wi şerê Tirkan dîkîr heta sala 1903'an ji wexta şerê 1914'an bavê min digot neçine şerê. Dîvê pêşî em piştê Tirkan bîdine erdê. Dema Şêx Seid, bavê min bî Mala Eliyê Ünîs va hevaltiya şoreşê kir, heta 1929'an li wê derê ma. Dawiya wê salê hate Sûriyê li Cizirê ma. Dî sala 1930'an da wextê effû derket vejeriya welat û li wira her karê xwe berdewam kir. Lê disa dî sala 1941'an da hate vîra û paşê wefat kir. Navê min ji nuha

dibêjin Evdîlayê Mela Reşîd.

ROJA NÛ: *Seyda dema qala Ehmedê Xani, Mem û Zin tê kîrî tu çî fehm dîki?*

E. M. REŞID: Mem û Zin berê dî nav xelkê da bî navê Memê Alan hebû û bî sîtran digotin. Şêx Ehmedê Xani ani kitêbek çêkir û navê wê dani Mem û Zin.

Herdu ji çirokek in, temsîlek in. Ji bo xatirê welatê Kurdistan digel dijminan da çawa ye? Qîsa Siyabend û Xecê ji her wîlo ye. Yani Siyabend aşiqê Xecê ye. Dî siya wê da nêriyê kovi heye. Pey diçe stirû li piştê dixê. Yani dîvê Siyabendê ku Xecêya xwe digere haj xwe hebe. Milletê Kurd ji heke bixwaze bihijê azadiya xwe dîvê bîzanîbe dî pêşiya wi da dijwari gelek in; nebêje Riya Azadiyê bî gul û rihanana va tîji ye. Her wîlo Şêx Ehmedê Xani û çiroka Memê Alan ji wîlo ye.

Ehmedê Xani dibêje, Kurd evindarê jiyana xwe, azadiya xwe ne. Çimki jiyana bîndesti jiyana ne serbesti ne jiyana insana ne. Ew jiyana pez û heywana ne. Çawa jiyana pez û dewaran dî bîndestê xelkê da

nin. Lê dî insanan da irade, win, daxwaz, hîş, aqîl heye. Ew tîştana ji her tîştî hetta ji milyaketan ji çêtir e. Ija wi ra nayê ku bîndest bîmine. Milletê Kurd ji zû va ketiye bîndestê dijmin. Hina dî tarîxa Iskenderê Makedoni da. Iskenderê makedoni hat bî Dara ra şerkîr. Dara lî bîniya Mêrdînê bû û paşayê Kurdistan bû. Ew hate girtin û dûra kuştin.

ROJA NÛ: *Seyda lî gor ku te bîhistiye, ditiye çend pirtûkên Ehmedê Xani henin?*

E. M. REŞID: Heta 100 pirtûkên wi hebûne. Tirk lê gerîyan û şewitandin. Şoreşa Sasonê dî sala 1926'an da qumandarên Tirkan dîhatin li gundan digerîyan, gava Mem û Zin dîditin û weha digotin: "Ev Xani bûye felaketeka me ya iroyin. Sebeba van şoreşan tev ew e. Eger min Şêx Ehmedê Xani girtiba, minê hestiyê wi bişewitanda."

ROJA NÛ: *Dîkari navê pirtûkên Xani ji me ra bibêji?*

E. M. REŞID: Walle wunda bûne. Hinek wan henin. Yusuf û Zûlêyxa, li wi da behsa Kurdistan dîke. Ewi ji

wek Mem û Zin nivisiye. Nûbwehara Piçûkan, Eqîda Imanê heye.

ROJA NÛ: Baş e seyda dî derheqa Mem û Zinê da tu çî dikari ji me ra bibêji?

E. M. REŞID: Dî Mem û Zin da dibêje: Ev kitêb mîn çêkiriye, mîn kiriye bahane bona derdê xwe. Ne ku qiseki heqiqeti waqiyî heye, ew xeyalî ye. Ija halê Kurda wîlo ma heta êsta. Dî islamê da Kurdan dewletên xwe û mabedên xwe çêkîrî heta roja hereketa qewmîyetê çêbe. Berê ku hereketa qewmîyetê çêbibe, Ehmedê Xani pê hesiyaye. Dî wan wextan da anî Mem û Zin nivîsi.

Go Memo, yanî milletê Kurd, navê Memo jî Mihemedê tê yanî navekî pîroz e. Ev Memoyê ku evindarê Zina xwe ye jî bo jîna xwe. Herfa "z" carna dî Kurdi da bî "j" tê guhurandî. Bo nîmûne em bêjî "Ez û tu jî" xelkê Licê dibêjî "Ez û tu zî" Zin mena jîr e. Yanî Kurd evindarê jiyana xwe ye. Nişana wî çî ye ku Kurd evindarê jiyana xwe ne. Ewqas felaket hatine serê gelê Kurd lê Kurd ne welatê xwe, ne jî zîmanê xwe berdane.

Tarix dibêje ew hatîbûya serê Sinê (Çinê) wê ew dî nav cihanê da wunda bîbûyana. Yanî mileteki bî hikûmet û bî dewlet wê jî ortê rabûya. Çawa Kurd mane dî nav tarîxa reş û tarî da. Ne zîmanê xwe ne welatê xwe berdane. Xelk xwastî, Ebbasiyan 200 sal serê Kurdan kîrî. Tesîrê lî ser zîmanê Kurdên ne

koçer kîrî. Bî taybetî wekî Torê dî çîyayê Sason da, dora Sêrtê, Mêrdînê, newala Rihayê, Colemêrgê da Erebkî piçîk kete zîmanê Kurdi. Lê Kurd zîmanê xwe wunda nekîr. Mena vî Kurd evindarê jiyana xwe ye.

Belê Xani dibêje: Kin e yê nî ku nahêlî, ev Kurd bîghîjîne jiyana xwe, azadîya xwe? Dibêje hakîmê welat e ku navê wî Zeyneddîn e. Mirê ku heyata dîn e. Yanî dîn û Mir bî hevra girêdayîne. Dîn û hakîm bî hevra nîn. Çî hakîmê Romê, çî Ebbasî, çî Emewî û çî yê Osmanîyan bû daimen Mir jî xwe ra kîrîne destîk. Jî bo milletê Kurd bîndest bîhêlî. Em seh nakî jî wan hakîman ku wekî dînê Îsa yan jî dînê Muhemmed bîmesînin. Lê ewana her tîm zor û zordar bûne.

Belê Mir Zeyneddîn bûye. Kê destîka wî bûye? Ku dihêle ew millet jê ra bîmine? Dibêje ew meriv xayîne millet e û jî wan ra dibêjî Bekoyê piç. Yanî Bekoyê ye, yanî mîrfîd e, ebabelek e, piç e, yanî bî fikra xwe va, bî hîşê xwe va ne Kurd e. Gerçî xwîna wî, xwarî û vexwarîna wî jî milletê Kurd e, lê belê hîşê wî, fikra wî dijîmî e. Kurmanc dibêjî "Mar çîl lîngê wî heye" a ev e, yanî çîl lîng dî nav zîkê wî da ne. Jî bo dijîmî kardîkî. Ew jî du qîsîm hene. Qîsmek jî wan ku dijîmî pere dîde wan, wekî ewên xûyayî nîn. Eger şêx in, axa nîn, jî eşîra nîn yê dewlemend in, ewana girêdayî dijîmînan in.

Qîsmê ditîr heye ne ku bî dijîmînan ra girêdayî nîn. Pere distînnî lê dijîmî fikrê xwe, gotînen xwe, daxwazên xwe dî serê wana da top kîriye û şandiye nav Kurdan. Ija ew bî dîl û can xîzmeta dijîmî dîke. Çîmkî fikra wî ew e. Belkî ew hî dijîwartîr e. Jî axa û began. Beg û axa roja pere nebîne dev jê berdîde. Lê ewên dîn bî dîl û can bo dijîmî kardîkî.

Şêx Ehmedê Xani dibêje, ew Bekoyê piç in. Ne ku şexsek e. Gelek cûrê wan henîn. Wek marên çîl-lîngî nîn, çîl textîtên wana henîn.

Pîştîre Şêx Ehmedê Xani dibêje bes e. Memo yanî milletê Kurd bî çî awayî wê bîghîje Zina xwe, jiyana xwe? Dibêje: Çar qîsîm wî ra dîvê. Berê wan tîştan destpêkê mena wî karê wî ne çî ye. Faydê ya pêşîne ne ya paşîne. Ewên ku pêşîyê bî silah radîhêjî, wan tîştên dîn hafîz nakî, ew xeletî ye.

Yek jî dibêje lazîm e Arîf bî: Bîraki wî yê Arîf hebî. Arîf yanî nîzam û Partî hebe da ku millet kombîke. Hîş û fikrê wan kombîke, bîxe çokî da heta rîya rast nişanê wana ke. Dî nav wan zînar û tehtan da, jî şîverêkan da ku bîkeve bîkarîbe derxe. Dîvê Arîf hebî, nîzam hebî. Bê Partî qet çênabe, jî ber wî awayî 160 dewlet lî alemê çêbûye. Jî wana yek jî jî eşîran nebûye dewlet. Bî Partîyan va bûne dewlet.

Pîştîra bîrakê duduya, dibêje lazîm e Hesen hebî. Yanî dewleteki lî derva bî

û gihîştibe daxwaza xwe, gihîştibe dergistiya xwe. Sti ji xwe ra markiribe. Ew bikiribe alikariya milletê Kurd bike, waqiyet ji ev e. Tu dewlet nine ku ji bin kedxwari û bindestiyê bi tenê xwe xilaskiriye. Hindûyan ne tenê nefsa xwe xwe ji Ingilîzan xilaskirin. Efrîqa ne tenê nefsa xwe, xwe ji Firansîzan, Endenozya ji ne tenê serê xwe, xwe ji Holandayê xilaskir. Tevda ji her yeki bi alikariya dewletek dinê ku diji wi dewletê bûn, xwe rîzgarkirin. Ehmedê Xani dibêje, lazîm e ji me ra Hesenek hebi. Piştewanek me ji derva hebi. Piştewanê me ki be? Yê ku mesele heta wi bi me biqede, ne bi dijminê me biqede. Divê em evi fêmbikin, yanî ev Hesên bo me lazîm e. Bi gotinek din ji me ra Parti û dewletek derva ku aliyê me bike lazîm e.

Ya sîsiya, Şêx Ehmedê Xani dibêje, lazîm e Tacdin ji hebi. Taca din, ulemayê din pê rabîn. Çûnki dijmin ewil wana dike destikê xwe û diji me radike. Çawa ku Şoreşa Bedîrxan Paşa di sala 1847'an da şkest, sebaba wi ulemayên din bûn. Miftiyê Istenbolê kingê qirar da şerê himber Osmanîyan ne dirust e, ulemayên Kurdan ji bawer kirin. Di nav millet gerandin û şoreşa wi şkest. Sewra Mihemmed Paşa sala 1838-39'an da şkest. Mele Mihemmedê Xetê sebaba wê şkestinê bû. Tirka Mele Mihemmedê Xetê qani kirin, gotin emê heqê Kurdan bê şert bîdîn. Ew ji rabû hitap da û got:

Şerê bi hikumeta Osmanîyan va ne dirust e, guneh e. Mihemmed Paşa ma heyirî, çû Istenbolê bi Tirkan va guftûgo bike. Pêşiyê qedrê wi girtin paşê anîn li Trebzonê xeniqandin. Her tim dijmin bi vi awayî dikin. Dewa dinî dixebitîn, bi navê diyane-tê me dixapîn.

Ija Ehmedê Xani dibêje Tacdin divê pê rabîn. Çawa ku Gandî heta ku bi diyane-tê ihtiram nekir tîstek bi dest nexist. Paşê her sibe diçû ibadeta agir dikir. Ji ber ku milletê wi ji wilo bû. Ew di riya milletê xwe da bû. Taca din di nav milletê Kurdan da berê va pir in. Di sala 1777'an heta nuha gor zanina min 64 şoreşê Kurdan çêbûne. Yek du jê derxe yê din tevda şêx û mella bûn. Lê hin şêx û mella ji diji wana bûn.

Şêx Seidê Palo rabû, şêxên Hizanê diji wi bûn. Dişî ji wana hin kes bûn sedema kuştina 70 hezar Kurd li Araratê. Ija divê em haj xwe hebin.

Divê birayên çaran ji hebe. Ew ji Çeko ye. Yanî yê ku radîhêje çek û silahan dibe pêşmerge.

ROJA NÛ: Seyda Evdilla, tu ji çawa baş dizani, wan demên ku Ehmedê Xani jiyaye, nivîskar pirani pirtûkên xwe bi Farisî an ji bi zimanê Erebi nivîsîne. Gelo Ehmedê Xani çima pirtûkên xwe bi zimanê Kurdi nivîsiye?

E. M. REŞID: Çûnku ew Kurdiyê dixwaze. Miroveki rast, fîkra wi, hişê wi, dilê wi, imana wi, bawe-

riya wi her tim li ser gelê Kurd bû. Ew dibêje: Divê ev millet xilaskibe, lewma bi zimanê Kurdi nivîsiye.

ROJA NÛ: Seyda baş e pîrseke din, çima Mem û Zîn heta pirtûkên din ji pexşan nivîsiye, her wek helbestan nivîsiye? Gelo sedemên wê yekê çi nîn?

E. M. REŞID: Belê, çûnki xwediyê Kurdan nebû. Nesir û yê din wunda dibûn, neyar wunda dikirin. Heke ne şîer bibûya wê hemû wunda bibûna. Nesir bûya xwedi tunne bû. Suxte û xelk şîeran zû ji berdîkîrîn û dixwendin, bi wi awayî ewana wunda nedibûn. Aliyê din bi kêş û qafiye bûyin ji xweşê insanan diçe ew ji tesîrek e dinê ye. E. Xani pêşiya Mem û Zîn da dibêje: Eger xwediyê Kurdan hebûya minê Ala Kurdan hin bilindtir bikira.

ROJA NÛ: Seyda hin kes li vîra henîn ku tu ji dibêji qasî 10-15 qesideyên Ehmedê Xani cem wana henîn. Bi rasti tu ji bawer dikî ku ewana gîşk qesideyên Ehmedê Xani nîn?

E. M. REŞID: Belê ewana hemû qesideyên Ehmedê Xani nîn. Wek tu ji dizani di şîerên berê da şair navê xwe digotin. Di wan qesideyan da ji her navê Xani derbas dibîn. Bo nimûne di dawîya qesideyek xwe da weha dibêje:

"Dilê Xani eger çî gence-xane

Şukîr qet kes nego
"Xani" bi çendan."

ROJA NÛ: Seyda ev qesideyên ku di destê me da ⇒

STOCKHOLM:

NEWROZ`a 1995`a

Bı şahiyên mezın hat pirozkırın



*Koma folklorê
ya KOMKAR-
Swêdê, bı navê
KOMA
NEWROZ, reng
dabû şeva
Newrozê. Dı
wêneyê da
listikvan beri
derketina ser
sehnê xwe
amade dıkın.*

*Ev wêne ji roj-
nama Svenska
Dagbladet
hatiye wergirtın.*

FOTO: P. HOELSTAD

Federasyona Komeleyên Kurdistanê, wek her sal isal ji li Stockholmê cejna Newrozê bı şahiyêke mezın piroz kır. Roja 18`ê Adarê li salona Sporê Solna Hallen, li dor 2500 kes civıyan û cejna neteweyi piroz kırın. Gelek komên muzikê, yên govendê û gelek stranbêjên kurd beşdari bernama şahiyê bın. Hozan Şivan Perwer û hunermendên dın konsereke stranên me, bı kurmanciya jorê, kurmanciya jêrê û dımilki pêşkêşî guhdaran kırın. Komên govendê bı def û zurne listikên cuda şeva Newrozê geştır kırın.

Çapemeniya Swêdê bı firehi ci da Newrozê û

pirozkırına wê li Stockholmê.

Disa dı 21`ê Adarê da ji ali Komela Kurd ya Spångayê va wek her sal isal ji li çolê agirê Newrozê hat vêxıstın. Bı sedan kes li dor agir civıyan, li ber dahol û zurnê govend gerandın.



⇒

*nın gelo berê pirtûk bûne
û dewsa wana mane, yan ji
dı nav xelkê da her beta
iro maye û hin welatparê-
zên dilsoz ew weha ber-
hevkırine?*

E. M. REŞİD: Çawa mın
li jorê ji got nivisarên E.
Xani dijmin dişewitan, ji

ortê radıkır. Ji wana yek
yek filitine. Dı destê mın
da Yusuf û Zülêyxa heye.
Hin ez digırım ku yekê dın
ji peyda bıkıım. Pır caran ji
milletê Kurd ji ber tirsên
Tırk, Farıs û Ereban
kitêbên xwe bı xwe
dışewıtandın. Ev qesideyên

han bı destê welatparêzên
Kurd hatine berhevkırın û
heta nuha mane.

ROJA NÛ: Zor spas Sey-
da.

E. M. REŞİD: Belê ez ji
spasdariya we dıkım.

